



: kurmanji

Informasjon til enslige mindreårige asylsøkere



NOAS

## ZANYARÎ BO PENABERÊN NEBALIX YÊN BITENÊ

BO WAN KESÊN KU EMRÊ WAN DI NAVBERA 15 Û 18 SALAN DE YE

Gelo emrê te kêmtir ji 18 salan e? Gelo tu bê dê û bav yan kesên dîtir yê ku dê li te binêrin hatiyê Norwecê bo daxwaza mafê penaberiyê bikî, yanî bo parastinê? Eger weha be, wê demê tu kesekî ku em weke penaberê nebalix yê bitenê binav dikin.

Ev broşur zanyariyan (informasyon) dide te di derheqa ka dê çi biqewime dema ku tu li Norwecê daxwaza penaberiyê bikî, û weku penaberekî nebalix yê bitenê te çi maf û erk (wacib) li vî welatî hene.

## DI DERBARÊ MALBATA TE DE KU LI WELAT E:

Eger UDI nizanibe cihê malbata te li kû ye, ew dikare li wan bigere. Girîng e ku tu agahdariyan di derheqa malbata xwe de bidî UDI.

Girîng e ku tu behsa malbata xwe ji UDI re bikî û jê re bêjî ka ew li kû ye.

UDI dikare li malbata te bigere.

## 1. GELO KÎ XUDAN MAFÊ PENABERİYÊ YE?

- Mafê te heye daxwaza mafê penaberiye bikî eger tirs hebe tu bêyî kuştin, îşkencekirin yan jî rastî êrişên cidî yên dîtir bibî, eger hat û tu vegeyiyayî welatê xwe.
- Eger rayedarên welatê te dikarin te biparêzin, yan jî eger li welatê te çihên ewle hebin ku tu bikaribî li wan bicih bibî, wê demê mafê te bi asayî nîne tu mafê penaberiye li Norwecê wergirî.
- Asta pêdiviyên wergirtina parastinê li Norwecê bo penaberên nebalix yên bitenê gelek çaran nizimtir e ji asta pêdiviyên ku bo mezinan derbas dibin.
- Pirska ka “gelo kî maf heye bête parastin” liser bingeha peymanên navneteweyî ku Norwec jî bi wan pêbend e, tê çareserkirin.

## 2. GELO KÎ DIKARE IZNA NIŞTECIHBÛNÊ LI SER BINGEHA MIROVPERWERIYÊ BISTÎNE?

- Eger tu ne hêjayî parastinê bî, dê rayedar hizir bikin ka gelo tu pêdviyên izna niştecihbûnê (rûniştinê) ji ber sebebên mirovperweriyê yên zexm bicih tinî yan na, yan jî gelo girêdaneka teyî taybet bi Norwecê re heye yan na.

## 3. IZNA NIŞTECIHBÛNÊ YA BISÎNOR BO KÎ TÊ DAYIN?

- Eger sedema wergirtina mafê niştecihbûnê (rûniştinê) li Norwecê ew rastî ye ku Rêveberiya biyaniyan ya Norwecê (UDI) nizane ka gelo tu dê bi awayekî minasib werî xudankirin eger tu vegeyiyayî welatê xwe yan na; wê demê izna niştecihbûnê ya bisînor dikare bo te were dayin. Ev yeka han tê pêkanin eger emrê te ji 16 salan zêdetir be dema ku UDI li serîlêdana te dinêre. .
- Izna niştecihbûnê ya bisînor derbasbar e, lê tenê heta roja ku emrê te dibe 18 sal.
- Izna niştecihbûnê ya bisînor nikare were nûkirin (dirêjkirin) û ew mafê hatina welatê Norwecê nade malbata te.

## 4. JI KÎJAN WELATÎ TÊ XWESTIN KU LI SERÎLÊDANA TE BO WERGIRTINA MAFÊ PENABERİYÊ BINÊRE?

- Li serîlêdana hemû kesên ku li Norwecê daxwaza penaberiye dikin, nayê nêrin. Di peymanê hevkarîyê a Dublin de, ku peymaneka hevkarîyê ye di navbera welatên Ewropayê de, hatiye diyarkirin ku serîlêdana te dê tinê ji aliyê yek welatê beşdar ve lê bête nêrin.
- Eger berî hatina te bo Norwecê te li welatekî dîtir yê Ewropayê daxwaza penaberiye kiribe, yan jî eger dê û bavê te yan jî kesên dîtir yên ku ji xudankirina te berpîrs in li wî welatî bin, wê demê rayedarên Norwecê dikarin te bişînin wî welatî da ku serîlêdana te li wir lê bête nêrin.
- Bi emrazên weku kontrolkirina pencemoran, dê rayedarên Norwecê bikaribin kifş bikin ka gelo te li welatekî dîtir daxwaza penaberiye kiriye yan na.



- Eger rayedarên Norwecê biryar bidin te bişînin welatekî dîtir yê Ewropayê, mafê te heye ku tu biryara wan istinaf bikî, û parêzerê te dê di vî warî de alîkariya te bike.
- Eger te berê daxwaza mafê penaberiyê li welatekî dîtir yê Ewropayê kiribe, tu dikarî di dema hevpeyvînê de digel Rêxistina norwecî bo alîkariya penaberan (NOAS) behsa vê prisê bikî da ku tu zanyariyên berfirehtir werbigrî.

## 5. KÎ DÊ LI DAXWAZA TE YA PENABERİYÊ LI NORWECÊ BINÊRE?

Rêveberiya biyaniyan ya Norwecê (UDI) beşek e ji dewleta Norwecê. Ew bi te re hevpeyvînê dike û biryarê dide ka gelo tu hêjayî mafê niştecihbûnê wergirî yan na. UDI hemû daxwaznameyên penaberiyê dinirxîne û li her daxwaznameyekê bi awayekî takekesî (ferdî) dinêre.

## 6. ÇI DIBE DEMA TU DAXWAZA PARASTINÊ DIKÎ?

Li destpêkê tu xwe li cem polis weku penaber qeyd dikî

- Polis wêne û pencemorên te digre. Ew di derbarê babetên wekî, tu çi kesî û tu çawa hatî Norwecê, pirsan ji te dike.
- Eger te pasport yan belgeyên dîtir hebin ku kîbûna te didin diyarkirin, girîng e ku tu wan di dema qeydkirinê de li cem polis, radest bikî.



### **Te diguhêzin navendeka pêşbazîkirinê (kemp)**

- Piştî qeydkirinê li cem polis dê te bişînin navendeka pêşbazîkirinê (kemp) bo penaberên nebalix ên bitenê. Tu dê di dirêjahiya merhaleya destpêkê da li wir bicih bibî.
- Pişt re dê te biguhêzin navendeka pêşbaziye ya dîtir.
- Eger emrê te ji 16 salî kêmtir be, wê demê hem mafê te heye û hem jî liser te ferze ku tu biçî dibistanê eger ihtimala mana li Norwecê ji 3 heyvan zêdetir be. Eger temenê te di navbera 16 û 19 salan de be, dibe ku şiyana te hebe tu biçî dibistanê, lê tu ne mecburî biçî.
- Giriş e ku tu bi karmendên navenda pêşbazîkirinê re bipeyivî eger hat û tu rûbirûyî hin zehmetiyan bûyî. Ew dê guhdariya gotinên te bikin û alîkariya te bikin eger tu mehtêcê alîkariyê bî. Karmendên navenda pêşbazîkirinê berpirsîyar in ji xudankirina te ya rojana.

### **Tu dê ji ber êşa zirav (sil) bêyî fehsîkirin**

- Di dirêjahiya çend rojên destpêkê de li navenda pêşbazîkirinê, tu dê ji ber nexweşiya êşa zirav (sil) bêyî fehsîkirin. Herkes mecburî vê yekê ye. Eger tu bi êşa zirav bî, tu dê werî dermankirin.
- Eger kêşeyeka teyî tendirustiyê (saxiyê) ya cidî hebe û pêdvî bi dermankirinê hebe, lazim e tu karmendên tendirustiyê agahdar bikî.

### **Tu dê zanyariyan û rênişanderiyê ji rêxistina NOAS wergirî**

- NOAS (Rêxistina norwecî bo alîkariya penaberan) dê filmekî zanyarî di derbarê pêvajoya penaberiyê de nîşanî te bide, û bi zimanekî ku tu baş jê têdighî.
- Piştî ku te li vî filmî temaşe kir, dê erkdarkê ji NOAS bi te re biaxive. Ew qisekirin dê bi zimanekî be ku tu baş jê têdighî. Tu dê zanyariyan di derbarê naveroka pêvajoya serilêdana penaberiyê de û herweha di derbarê maf û erkên (wacibên) te de, wergirî. Ew qisekirin dê te ji hevpeyvîna penaberiyê re amade bike. Giriş e ku tu vê qisekirinê bikarbinî bo pirsiyarkirina hemû wan pirsên ku di hişê te de hene di derbarê serilêdana bo parastinê de.
- NOAS rêxistineka mafên mirovan ya ne-hikûmî ye ku bo parastina mafên penaberan li Norwecê kar dike.
- Xebatkarên NOAS pêbendî erka (wacibe) nihênibûnê ne. Wateya vê yekê ew e ku tu tiştêkî ku tu ji NOAS re, ji UDI re, ji polis yan ji kesekî dîtir re bejî, nayê eşkerekirin. Ji ber vê yekê, ji dana ravekirinên dûr û dirêj di derbarê egerên daxwazkirina parastinê de, netirse.

### **Dê çavdêrekî demkî bo te were teyînkirin**

- Çavdêrê demkî (berpirsîyarê wextî) yê te kesekî emirmezin e ku dê miqateyî parastina mafên te be. Çavdêrê demkî dikare di cihê te de hin biryaran bide ku dê û bavê dê bi şeweyekî sirûştî bidana, eger ew ligel te bana.
- Heta ku tu li vê derê bî û bê dê û bav yan kesên xudankar ên dîtir bî, mafê te heye ku çavdêrekî demkî bo te bête teyînkirin heta roja ku emrê te dibe 18 sal
- Çavdêrê demkî yê te ne karmendê dezgeha UDI ye.
- Çavdêrê demkî dê beşdarîyê bike di hevpeyvîna penaberiyê ya te de digel UDI.
- Eger tu hatî guhastin bo navendeke pêşbazîkirinê (kemp) ya dîtir, dê çavdêrekî demkî yê nû bo te were teyînkirin.

### **Dê parêzerek ji te re bê teyînkirin**

- Parêzer ew kes e ku yasayên (qanûnên) Norwecê baş dizane û di biwarê serilêdana te ya penaberiyê de alîkariya te dike.
- Her kesekî ku xweş diyar e ku emrê wî ji 18 salan kêmtir e, destekdaneka yasayî ya bê pere werdigre berî hevpeyvîna penaberiyê ya bi UDI re. Bo yê dîtir dê parêzer ji wan re were teyînkirin piştî zanîna temenê wan yê rast yan piştî hevpeyvîna penaberiyê.

### **UDI dê hevpeyvînê digel te bike**

- Hevpeyvîna penaberiyê derfeta te ya herî girîng e bo ku tu ji UDI re rave bikî ka bo çî tu daxwaza parastinê dikî û tu dîtirsî çî were serê te eger hat û tu vegeyiyayî welatê xwe. Pêwîst e tu ravekirineka hûr û kûr û zelal di derbarê vê yekê de bidî dezgeha UDI.



- Herweha pêwîst e tu di dema hevpeyvînê de ji UDI re bêjî ka tu kîyî, rewşa malbata te çîye û rêwîtiya te bo Norwecê çawa çêbû.
- Di dema hevpeyvînê de dê tu, berpirsekî UDI, çavdêrê demkî yê te û wergerê beşdar bibin.
- Werger dê ji bilî wergerandina gotinên te û yên berpirsê UDI tiştêkî din neke û ruxseta wî/wê nine ku tiştên ku wî/wê ditine yan bihîstine di dema hevpeyvînê de, ji kesên dîtir re bêje.

### **Vekolîna (fehsa) temenî**

- Li Norwecê temenê te weku kesekî penaber girîng e dema tu daxwaza penaberiyê dikî. Serilêderên ku emrê wan ji 18 salan kêmtir e weku zarok têne hijmartin û ji ber vê yekê mafên wan ji yên mezinan hêj zêdetir in.
- Ji ber ku zarokên ku daxwaza parastinê dikin mafên wan hêj zêdetir in ji yên mezinan, hin caran hindê kesên mezin jî dibêjin ku ew kêmî 18 salan in. Hindê kesên din ku daxwaza penaberiyê dikin, ji temenê xwe yê rast ne ewle ne. Ji ber vê yekê UDI hema bêje ji hemû kesên ku dibêjin emrê wan di navbera 15 û 18 salan de ye, dipirse ka ew qebûl dikin ku fehsa temen bo wan bête kirin yan na.
- Fehsa temenî ji hin vekolînên bijîşkî pêk tê, û ew nişan dide ka temenê te nêzîkî çend salan e. Tu dê zanyariyên berfirehtir di derbarê ka ev fehsa han ji çi pêk tê, wergirî.
- UDI tiştên dîtir jî ên ku dikarin tiştêkî di derheqa temenê te de bêjin, weku nasname, sertîfîka û zanyariyên ji welatên dîtir, dinirxîne. Girîng e ku tu tiştê ji dest te bê bikî û bibî alîkar da ku pirsên di derheqa him temenê te de û him jî di derheqa nasnameya te de, zelal bibin.
- Fehsa temenî xwazekî ye. Eger tu nexwazî li temenê te bête vekolîn, îhtîmal heye ku tu weku kesekî balix (emirmezin) werî qeyd kirin. Ev yek dikare xudan girîngî be bo serilêdana te.
- Eger tu biqest temenekî nerast bidî, û UDI bighije wê qna'etê ku te pêdvî bi parastinê li Norwecê nine, wê demê tu dikarî werî dersînorkirin. Dersînorkirin dikare bibête eger ku tu êdî nikaribî bizivirî Norwecê û gelek welatên dîtir yên Ewropayê di pêş de.
- Eger baweriya UDI ew be ku emrê te ji 18 salan bêhtire, dê çavdêrê demkî yan jî parêzer bo te neyê teyînkirin. Lê belê eger serilêdana te were redkirin dê parêzer bo te were teyînkirin.





## TU DÊ BERSIVEKÊ JI UDI WERGIRÎ:

Ruxseta niştecihbûnê (rûniştinê) yan redkirin

**Parêzerê te dê ji te re bêje ka gelo ruxseta te heye tu li Norwecê bimînî yan na.**

**Eger tu ruxseta niştecihbûnê wergirî, tu dê li şaredariyekê (belediye) bêyî akincîkirin**

- Di derbarê vê yekê de tu dê ji teref karmendên navenda pêşbazîkirinê (kemp) ve zanyariyên berfirehtir wergirî.

**Eger tu ruxseta niştecihbûnê ya bisînor wergirî, dibe ku te bişînin navendeka pêşbazîkirinê ya dîtir.**

- Tu dikarî nerazîbûna xwe di derbarê vê ruxseta niştecihbûnê de diyar bikî û parêzerê te dikare alîkariya te bo vî tiştî bike.
- Di derbarê vê yekê de tu dê zanyariyan berfirehtir ji hêla karmendên navenda pêşbazîkirinê wergirî.

**Eger serîledana te were redkirin, tu dikarî biryara redkirinê isitnaf bikî**

- Bi awayekî giştî tu dikarî li Norwecê bimînî di dirêjahiya çaverêkirina bersiva istinafê de.
- Parêzerê te dê alîkariya te bike tu nameyeka istinafkirinê binivîsî û bixwazî ku rayedarên norwecî careke dî li serîledana te bo wergirtina mafê penaberiyê binêrin.

**Eger istinafa te jî were redkirin, wê gave tu mecburî vegeerî welatê xwe**

- Ji bona vegeera welat tu dikarî alîkariyê ji Rêxistina Navnetewî ya Koçberiyê (IOM) wergirî. IOM dikare mesrefa rêwîtiya te bigre ser mile xwe û alîkariya te bike tu belgeyên rêwîtiyê bidest bixî.
- Tu dê zanyariyên berfirehtir di derbarê vegeera welatî de ji karmendên navenda pêşbazîkirinê wergirî.



## EGER TU BIXWAZÎ VEGERÎ WELATÊ XWE, TU DÊ BIKARIBÎ ALÛKARIYÊ JI BO VÊ HINDÊ WERGIRÎ.

- Herweha tu dikarî alîkariyê bo vegera malê bistinî hem berî ku tu bersivê ji UDI wergirî, di wê navberê de ku tu têde çaverêyî bersiva istinafkirinê wergirî yan jî piştî wergirtina redkirina serlêdana ya penaberiyê.
- Herweha pêwîst e ku çavdêrê demkî yê te jî vê biryarê bipejirîne.
- Dezgeha ku dikare alîkariya twe bike tu vegeirî welatê xwe, IOM e. IOM dikare mesrefa rêwitiya te bigre ser mile xwe û alîkariya te bike tu belgeyên rêwitiyê peyda bikî.
- Dibe ku tu hindê pere wergirî, eger tu bi irada xwe vegeirî malê bi alîkariya rêxistina IOM'ê. Deselatdarên Norwecî xwedî bernameyên reîntegrasyonê (ji nûve xweguncandin ligel civatê) ne bo hin welatên belî. Eger li welatê te bernameyeka weha hebe, tu dê bikaribî destekdana diravî wergirî dema tu vegeirî malê.
- Tu dikarî li ser vê babetê digel karmendên navenda pêşbazîkirinê biaxivî û zanyariyên berfirehtir ji wan wergirî.

### Şîretên giring ldi derheqa hevpeyvîna penaberiyê de

- Dûr û dirêj û bi lêhûrbûnî rave bike (ron bike) û bide xuyakirin çima tu neçar bûyî welatê xwe terk bikî û çî tirs li ser te heye eger tu bizivîrî welatê xwe.

- Li ser tiştên ku bi serê te hatine raweste û bide xuyakirin ka dê çi biqewime eger tu neçar bibî û vejerî welatê xwe.
- Li ser pirsên di derbarê temenê te de, bersivên bi cî , hûr û zelal bide.
- Çiqas mumkin be ewqas bi lêhûrbûnî bersivan be.
- Eger bi te re zarok hebin, behsa rewşa wan û serboryên wan bike.
- Eger tiştêkî ku tu fam nakî hebe, daxwaza ronîkirinê ji hevpeyvînerî (karmendê UDI) bike.
- Eger di destê te de belgeyên ku têkildarî serlêdana te bo penaberiye ne hebin, divê tu wan bi xwe re bibî hevpeyvînê.
- Rastiyê bêje. Eger tu zanyariyên nerast bidî, ew dikare bibe egera wergirtina redê/bersiveka negatîv. Herweha tu dikarî werî dersînorkirin ji Norwecê, ku ew jî dikare bibe sedem ku tu êdî nikaribî dubare bizivîrî Norwecê û zêdetirê welatên dîtir yên Ewropayê di pêş de.

## ERK (WACIB) Û MAFÊN TE WEKU KESEKÎ PENABER

### **Li ser te ferz e hevkarîyê bikî da ku nasnameya te bête diyarkirin**

Bo rayedarên Norwecî girîng e ku bizanin tu çi kesî û temenê te çend sal e. Ji ber vê yekê girîng e ku tu belgeyan pêşkêş bikî ku kibûna te kifş dikin. Eger tu têyî tepeserkirin (xwîniyî) ji aliyê rayedarên welatê te ve, dê rayedarên norwecî ji te nexwazin ku tu têkildar bibî bi wan re bona bidestxistina belgeyên nasnameyî.

Eger rayedarên Norwecê bi şik bin di derbarê nasnameya te de, dê wê gavê tirs hebe ku:

- bawerî bi gotinên te neyê
- şansê te bo wergirtina ruxseta niştecihbûnê qelstir bibe
- mafên te yên heyî ji dest bidî
- ruxseta niştecihbûnê ya bisînor bo te were dan

### **Li ser te ferz e ku tu zanyariyên rast bidî**

Weku kesekî penaber pêwîst e tu rave bikî ka çima tu daxwaza parastinê dikî. Ji ber vê yekê lazim e çi ji destê te tê tu bikî, tu belgeyên pêwîst teslîm bikî û hevkarîyê bikî.

Berî ku tu daxwaza penaberiye bikî kî ji te re çi gotibe bila gotibe; ya herî girîng ew e ku tu egerên rast yên li pişt daxwazkirina penaberiye ji deselatdarên norwecî re rave bikî. Dana zanyariyên nerast tawan e û dibe sedema lêpîrsîna qanûnî. Herweha ew dikare bibe egera dersînorkirinê.

### **Dibe ku mafê te yê karkirinê hebe di wê navbeynê de ku tu hîn penaberî**

Eger tu bikaribî nasnameya xwe bi belgeyan îspat bikî, bi awayekî normal bi rêya pasporta xwe, dibe ku mafê te hebe tu izna karkirinê di wê demê de ku tu çaverêyî bersivê yî, wergirî. Pêwîst e ku çavdêrê demkî yê te digel te hemfikir be û pêdvî ye karê te çuyîna dibistanê asteng neke.

### **Mafê te yê dermankirina bijîşkî heye**

Mafê te yê dermankirina bijîşkî ya pêdvî heye di dema ku tu hîn têde çaverêyî bersivê di derbarê serîlêdana penaberiyê de wergirî. Li Norwecê hemî kesên ku emrê wan ji 16 salan bêtire bi asayî pêdvî ye ku beşekî ji mesrefan ji kîsê xwe bidin. Eger te pêdvî bi alîkariya psîkolog (dextorê derûnî) hebe, tu dikarî ji UDI bixwazî mesrefa vê bide. Di derbarê vê yekê de têkildar bibe bi karmendên navenda pêşbazîkirinê re ji bo wergirtina zanyariyên berfirehtir. Eger te pirsgirêkek mezin ya tendirustiyê hebe, pêdvî ye tu UDI û çavdêrê demkî yê xwe ji vê yekê agahdar bikî.

### **Derfeta te heye ku tu serîlêdana xwe bo penaberiyê paşve bikişî**

Her dema ku tu bixwazî tu dikarî serîlêdana xwe ya penaberiyê paşve bikişî. Pişt paşvekişandinê dê rê hebe tu serî li rêxistina IOMê bidî û jê bixwazî alîkariya te bike tu vegeerî mal.

### **Gelo tu dixwazî alîkariyê wergirî bo dîtina dê û bavê xwe yan endamên dîtir yê malbatê?**

Eger tu dixwazî alîkariyê wergirî bo têkildarbûnê digel yan dîtina dê û bavê xwe yan endamên dîtir yê malbatê, tu dikarî peywendiyê digel karmendên navenda pêşbazîkirinê bikî.

Herweha rêxistina Xaça Sor (Røde kors) dikare alîkariya te bike tu malbata xwe bibînî.

### **ERKA (WACIBÊ) PÊBENDIYA NIHÊNÎBÛNÊ**

Polîs, UDI û UNE hemû pêbendî erka nihênîbûnê ne. Wateya vê yekê ew e ku, ew nikarin zanyariyan di derbarê serîlêdana penaberiyê ya te de bi rayedarên welatê te re parve bikin. Ew herweha ne ruxsetdar in ku wan tiştên ku te ji wan re gotiye, ji kesên dîtir re ku liser serîlêdana penaberiyê ya te naxebitin, bêjin. Binpêkirina wacibê pêbendîya nihênîbûnê tawane û cizayê wê heye. Ji ber vê hindê netirse û dûr û dirêj egerên li pey daxwazkirina te ya parastinê, rave bike.

Werger, parêzer, karmendên saxiyê (tendirustiyê) û NOAS jî pêbendî erka nihênîbûnê ne. Wateya vê yekê ew e ku nabe tu kesek ji wan tiştên ku te ji wan re gotiye, ji kesên dîtir re bêje, heta ji UDI, UNE yan ji polîs re jî.



---

## ADRESSER

### **POLÍS YA BÎŞKA BIYANIYAN**

Polís, ew kesên kû taze daxwazin penaberî dikin, tomar dike. Her wisa polís ew kesin kû pêştî refza dîmahîkî, li ser rizamendiya xowe li Nerwîci der nakewin, der dikete derewei Nerwîci.

**Nav û edrês bo name hinardini** : P.B 8102 Dep, 0032 Oslo, Norway

**Nav û edrêsa serdani** : Christian Krohgs gate 32, 0186 Oslo, Norway

Jomara telefoni: +47 22 34 24 00, Jomara faxi: +47 22 34 24 80

Imeil: pu@politiet.no

---

### **RÊWEBERIYA KARÛBARIN BIYANIYAN A NERWICÎ (UDI)**

Organe kî hikometiye kû eik ji karin vî çareser kirina daxwaz namin mafi penaberiyê, daxwaz namin.

yik girtina xizanî, daxwaz namin vîsa û ehliyeta Nerwîci dike. Her wisa UDI berpirsyari kempin penaberanê.

**Nav û edrês bo name hinardini** : P.B 8108 Dep, 0032 Oslo, Norway

**Nav û edrêsa serdani** : Hausmanns gate 21, 0182 Oslo, Norway

Jomara telefoni: +47 23 35 15 00, Jomara faxi: +47 23 35 15 01

Malpera interneti: www.udi.no, Imeal: ots@udi.no

---

### **RIKXIRAWA NAWNETEWY YA PENABERIYÊ (IOM)**

Dana agahdariyan li ser harîkariyê bo zivirina bi dili xwe

**Nav û edrês bo name hinardini**: P.B 8927 Youngstorget, 0028 Oslo, Norway

**Nav û edrêsa serdani** : Storgata 10a, 2. etg, 0155 Oslo, Norway

Jomara telefoni: +47 23 10 53 20, Jomara faxi: +47 23 10 53 21

Imeal: osloreturn@iom.int

Dema wekêrni : hemo rojan li demjimêr 10 – 15.00 Şemme û yekşemman daxisti ye

**KOMITE YA HELÇONEVE BÛ KAR Û BARÊN BIYANIYA (UNE)**

Komîta helçoneve bû kar û barin biyaniya weko dadgehekê kargiriye ya bû çareser kirina şikayetin ew kesane kû biryara ret bûni ji aliyê UDIê de wer girtine.

**Nav û edrês bo name hinardini :** P.Box 8165 Dep., 0034 Oslo, Norway

**Nav û edrêsa serdani :** Stenersgt. 1B/C,0050 Oslo, Norway

Jomara telefoni: +47 21 08 50 00, Jomara faxi: +47 21 08 50 01

Malpera interneti: [www.une.no](http://www.une.no), E-mail: [postmottak@une.no](mailto:postmottak@une.no)

**RÊKXIRAWA XAÇA SÛR YA NERWICÎ**

Xizmeta bidû geryanê û dîtinevê, harîkariyê diket bû ewe kû carek din peivendî dûrûst biket di navbeina endamin xizanî, ewin kû ji hev qetiyabin û dûr kevtibin ji ber sebaba şer u têkelçonê yan ji nakûkiyê yan ji karesat û wiraneka mezin.

Rêkxirawa Xaç a sûr ya Nerwicî tû agahdariyan seba nihênîyên te, nadet UDIê yan her layekê dî. Ev xizmeta kû diken, bê pareye ( bi xoraiye).

**Nav û edrês bo name hinardini:** P.O. Box 1 Grønland, 0133 Oslo, Norway

**Nav û edrêsa serdani:** Hausmannsgt. 7, 0186 Oslo, Norway

Jomara telefoni: +47 22 05 40 00

Malpera interneti: [www.rodekors.no](http://www.rodekors.no), lmeil: [tracing@redcross.no](mailto:tracing@redcross.no)

Ev broşur ji aliyê Rêxistina norwecî bo alîkariya penaberan  
(**NOAS**) ve hatiye amadekirin.

NOAS rêxistineka mafên mirovan ya ne-hikûmî ye ku zanyariyan û  
alîkariya yasayî (qanûnî) dide penaberan.



**Rêxistina Norwecî bo alîkariya Penaberan (NOAS)**

Nav û edrêsa serdani : Torggata 22, 0183 Oslo, Norway

Nav û edrêsa bo name hinardini : P.O. Box 8893 Youngstorget, NO-0028 Oslo, Norway

Jomara telefoni: +47 22 36 56 60, Jomara faxi: +47 22 36 56 61

Malpera interneti: [www.noas.org](http://www.noas.org), lmeil: [noas@noas.org](mailto:noas@noas.org)